# Dîhnên Xwezayê Yên Heebunê

## –1–

«Maf → Serbixwatî → Azadî»

### «Azadî» u «serbixwatî» du encam u berhemên herî bingehîn yên «mafan» in.

### Loma źî «azadî» u «serbixwatî» nikarin źi berî «mafan» b'ên.

### Źixwa kesê ku gêśtiye «mafan», him «serbixwa» u him źî «azad» e.

Rewśa milletê kurd ya heeyî ya berbi tunebunê va nikane bi nebuna «serbixwatî» u «azadî»yê va were girêdayîn, berevaźî vê bi «nebuna mafan» va girêdayî ye.
Her mafê ku di nav rewśa heeyî da milletê kurd b' dest dixe, dibe gavek u perćeyekî berbi «serbixwatî» u «azadî»yê va.
Helbet dibe ku ev «maf» yek bi yek yan źî bi giśtî werin b' dest xistin.
Bêguman ne normal e ku meriv li hemberî dayîn yan źî standina mafekî herî pićuk berevaźiyê bike u b' destxisitina wî «mafî» red bike.

### Ango hêmanên ku rewśa «serbixwatî» u «azadî»yê nîśan didin, ew źî pîvanên rewśa heeyî ya tê da ne.

Bêguman rewś, pîvan u hêmanên ku kurd di nav da ne, rewś, pîvan u hêmanên tirktiyê ne. Loma źî guhartineke zerurî u bingehîn ya bi kurdtiyê va girêdayî heebe-nebeyek e.

### Bê b' destxistina «mafan» meriv bi ti hawî nikare heebuna «serbixwatî» u «azadî»ya xwa îddîa bike.

### Kesê ku ne xwadî maf e, nikare hee bibe źî.
### Ango kesê ku tun e, nikane xwadî maf źî bibe (04.08.2012, 01:41, Zürich).

Źibo ku meriv bikare heebuna xwa îddîa bike, divêt meriv pêśta mafên xwa yên herî zerurî b' dest bixe.
Heebuna meriv b' destxistina mafên xwa va girêdayî ye.
Źiber ku kurd di nav xwa da mafên xwa yên herî zerurî nikarin praktîze bikin, nebuna kurdan raśtiyeke xwezayî ye.
Helbet di nav rewśeke hilo da înkarkarên kurdan bi maf ti carî «heebun»a kurdan qebul nakin.
Źibo ku meriv bikare «heebun»a xwa «l' xwa» îspat bike, divêt hêman u pergala herî bingehîn ya heebunê, «zmanê xwa» di nav «źiyana milletê xwa u yên din» da serdest bike.
Daku kurdan «dev» źi zmanê xwa berdanne u li śuna zmanê xwa yê înkarkarê xwa yê ku «hêmana nebuna kurdan» e, bi kar tînin, ti daxwazeke kurdan ya ku meriv bikare cîddî bigire, tun e.
Yanî kurd bi xwa bunne «îspata nebuna xwa».

Kesê ku herî zêde di derbarê «azadî» u «serbixwatî»yê da dipeyîve, bizanin ku yê herî «ne azat» u «ne serbixwa» źî ew bi xwa ye (28.07.2012, 15:30, Zürich).

Digel kurdan, bi radî źî di nav siyaseta kurdan da ev śema paś u pê tê bi kar hanîn: «Azadî → serbixwatî → maf». Źiber vê hindê ye ku kurdan heta hîro nekanîne bigêźin mafê kerekî źî.

Siyasetvan, ronakbîr, partî u kurdê/a ku di raśtiyê da xwadî ti mafekî bingehîn yê bi kurdbunê va girêdayî ye, nî ye, di nav hêman, pîvan u pergalên tirkbuyînê da tevdigerre, źi mafên ku źibo tirkbuyînê hatinne hafirandin îstîfade dike, nikare îddîa bike ku kurd e, kurdekî/e «azat» u «serbixwa» ye.